

Agahî derbarê acizkirina li xwandingehê bo dêbavên biyanîziman

Ev rêber bo dêbavên zarokên biyanîziman e anku bo wan dêbavan ku zimanê wan ne fînlandî, swêdî yan samî ye. Rêber agahiyên derbarê acizkirin, bêzarkirin û cudakariyê dide. Di rêberê de behsa derfetên rêgirtina li ber wan jî tê kirin.



etno

Etnisten suhteiden
neuvottelukunta

Etelä-Suomi

Li gor lêkolînan zarokên koçberan zêdetir neçarî acizkirina li xwandingehê û şideta leşî jî dibin.

Xortên koçber zêdetir bêheval in, û ji xortên din zêdetir tehdîda şidetê li wan tê kirin.

Wergirtina ji xizmetên şagirtan re pêşkêşkirî bo wan ji kesên din zehmettir e. Bi taybetî zarokên li derveyî welat jidayikbûyî tînan acizkirin.

Çavkanî: Wezareta edaletê, Acizkirin cudakarî ye 1/2018 | <https://yhdenvertaisuus.fi/policy-briefit>

Mebest ji **acizkirina li xwandingehê** ew e ku xwandekar bi berdewamî li xwandingehê tê acizkirin.

Acizkirin dikare bo nimûne wisa be ku kesek mirov dehf dide, lê dide yan dijûnan dibêje û tiraneyan dike.

Acizkirin dikare herwiha ji encama hiştina li derveyî komê, gotinên tehl an kiryareke wisa be ku armanca wê ziyangihandin an dilhiştina kesekî be. Acizkirin herwiha tê wê wateyê ku kesek acizkirî nayê qebûlkirin bo nav çalakîyên sinifê, komê yan koma gotûbêjan ya torê.

Acizkirin gelek caran tawan e.

Bo nimûne şkandîna şerefê, tehdîd û lêdna hinek tawan in ku têkilî acizkirinê ne.

Herwiha teşwîqkirin û alîkarîkirina acizkeran li gor qanûnê tawan e.

Çavkanî: Yekîtî zarokparêziyê ya Mannerheim | www.mll.fi

Acizkirin ew e ku kesekî bixin rewşeke nexweş bi kiryarekê yan gotina hin tiştên tehl.

Acizkirin bo nimûne ew e ku gotegotan li ser kesekî belav bikin, bibêjinê yan bi awayekî din dilê wî bihêlin.

Ew dibe cudakarî eger sebebê acizkirinê rengê kesî, netewe, dîn yan taybetmendiyeke din ya kesî be.

Çavkanî: Merriam-Webster (şiroveya ferhengî ya peyva "harassment")

Cudakarî tê wateya muamelekirina bi awayekî xirabtir li gel kesekî ji ber sebebên taybetmendiyê kesayî.

Li gor qanûnê nabe cudakarî dijî ti kesî were kirin bo nimûne ji ber:

- temen
- netewe
- dîn
- meyla seksualî
- esil
- ziman
- bawerî
- sebebekî din yê têkilî kesayî

Çavkanî: Nûneratiya wekheviyê | www.syrjinta.fi

Erk e ku her xwandingehê **bernameya wekheviyê** hebe.

Li gor Qanûna Wekheviyê (madeya 6) xwandingeh divê binirxîne ka çi bike daku ti kes neyê acizkirin, vederkirin yan bêzarkirin li xwandingehê.

Xwandingeh divê tişteki bike eger wekhevî li xwandingehê bi cih neyê.

Çavkanî: Desteya Perwerdeyê | www.oph.fi

Çawa dikarî dijî acizkirinê rabî?

Dikarî ji zarok re bibêjî ka zarok bi xwe dikare çi bike

"Zaroka/ê min, eger acizkirinê bibînî yan te aciz bikin, bibêje acizkeran ku tu qebûl nakî. Bêdeng nemîne, ji wê derê neçe û wisa neke heçku te hay ji acizkirinê nebe.

Eger gotin têra neke, bibêje hinek kesên din jî.

Bibêje mamosteyan, midûrê, hevalan yan li malê bibêje dêûbaban.

Ji dêûbaban, xwişk û birayan yan hevalan eger tu bi xwe nikarî yan naxwazî behsa meselê li xwandingehê bikî.

Mamoste yan karmendekî din yê xwandingehê dê bibêje midûrî.

Mirov dikare herwiha bi posteya elektronîkî yan peyameke Wilmayê behsa acizkirinê bo mamoste yan midûr bike.

Divê herdem mirov behsa acizkirin,

vederkirin û bêzarkirinê bike tevî ku ew ne dijî mirovî be jî.

Giring e ku herdem behsa acizkirinê were kirin

çunkî acizkirî bi xwe herdem nikare behsa wê bike."

Çavkanî: Xwandingeha normal li Viikiyê | Bernameya wekheviyê | www.helsinki.fi

Rêkarên xebatê bo dêûbaban

Pêşî mijarê vekole. Guhdariya zarok bike lê bi otomatîkî jê bawer neke. Li gel zarok û xwandingehê bi rehetî biaxive û sebebên nêrîna xwe bibêje. Xwandingeh dikare gotûbêjekê li gel acizkerî û dêûbabên wî saz bike. Pîranî caran bi gotûbêjê mesele çare dibe û acizkirin bi dawî tê. Bibêje zarokê xwe ku bawerî di navbera te û xwandingehê de dimîne. Bibêje zarokê xwe ku hûn wek dêûbab alîkariya wî dikin.

Şîret:

Ji komên mijûlahiyan yê derveyî malê mirov dikare hevalan bo zarokan peyda bike.

Çareyên zêdetir: Çavkanî: Yekîtî zarokparêziyê ya Mannerheim | www.mll.fi & <https://www.verywellfamily.com/ways-to-prevent-school-bullying-460755>

Çawa dikarî rê li cudakariyê bigirî?

Dikarî têkiliyê li gel nûneratiya wekhevîyê deynî eger şagirtêkî, mamosteyekî yan karmendekî xwandingehê zarokê te aciz kiribe ji ber reng, bawerî, ziman yan ji ber sebebekî din yê kesayî.

www.syrjinta.fi

Tawanên şidetî divê yekser bo polisî bên ragihandin.

Eger şidet li zarokê te hatibe kirin, bo nimûne kulm an pêhn lê dabe, meselê yekser bo polisî ragihîne. www.poliisi.fi



Centre for Economic Development,
Transport and the Environment



Monik ry
MEISTÄ ON MONIKSI!



Kuntoutussäätiö

Kymsote

MONIHელი

